BÎRANÎNA HEVRÊYÊN ME JIN YA KU

BEMIRININ, DI PELÊN BI TOZ Û ZİLAM PERESTÎ YA

DÎROKÊ DE EM Ê NETERIKÎNIN JI TUNEBÛNE RE!

BIJÎ PARTIYA ME TKP-ML

BIJÎ YEKÎTIYA JINÊN KOMÛNÎST

www.tkpml.com

ŞEHIDÊN XWE DI TÊKOŞÎNA KOMÛNÎZME DE EM Ê VEGUHERÎNIN MEŞALEYEKE YEK BI YEK

Em di nav heftêyeke wisa de ne ku; 45 sale ji bo Partî û Şoreşê şehid bûne bibîrtînin, rezgirtina jîyana û têkoşîna wan, kêliya heya dawî ala Partî ye ku hilgirtine soz didin em ê bilind bikin, radigihinin ku berjewendiyên gel, şoreş û Partîye di nav jîyan û têkoşîna xwe de cihê ye hêrî girîng de ye û rastê mirin gava ku hê derî nelêxist, bi gotina'tu bi xêr hatî' re em ê mirin pêşwazî bikin, me sond xwar ku behna xwe ya dawî ne li ser çoka xwe, li ser pîya em ê bidin.

Ji sala 1978 ve dawiya hefyêya meha Çilê ku Partiya me TKP-ML diyarî şehidên me kiriye, îsal wek KKB hevrêyen me jin ya ku heya a niha gihiştine şehibûne, ji bo jîyana wan ya kurt û têkoşîna wan tê de cih digire, me broşûreke amade kir. Jîyan û têkoşîna hevrêyen me jin a şehid ya di vê broşûre de ji bo me cuda bi cuda hêja ye. Rixme ku di der heqa piraniya wan de çi qas kêm tişt dizanin jî; di her pela dîroka Partî de navê wan ne be jî, di holê de jîyaneke kedkar û şoreşger heye. Tevlîbûna têkoşîna şoreşe berçav girtina bi hezar car bedel dayine, şikandina qalika pergale ve pewist e. Da ku em bifikirin ev bedel û pergal ji bo jin 2-3-5 car qalindtir e, negengaze ku neye dîtin, israrkirineke çawa, xurtbûyineke birdozî çawa, jîrbûneke çawa bar dike. Hevrêyên me jin ku di refên Partîya me de têdikoşin, ji ve israr, jîrî û xurtbûyina birdozî pir tişt hene ku hîn bibin. Lewma ne tenê di dawiya meha Çilê de, ne tenê di çerçoveya vegotinan ya kurt ê ku di vê broşûre de cih girtiye, divê em di nav hewldaneke de bibin da ku ji jîyan û têkoşîna ya hevrêyen me jin behtir tişt hîn bibin. Niqaşên ku dikin, perwerdeya ku tevlî dibin, sohbetên polîtîk ya rojane, an jî gava ku em bi pirsgirêkek ve rû bû rû bûn û ji bo çareserî mêjiya xwe dişxulinin; divê mînaka jîyana, gotina wan ku anîne li ser ziman, nêrinên sade ya têkoşîne divê were li ser ziman, parvê kirin, û bibe pêşeng.

Me bi dehan car dûbara kir û hê jî dûbare dikin; heya ku em dîroke xwe nenivîsin, dîroke nêçirvanan nivîsiye û dê binivîsin. Ev ne zelal kirine ku ji bo dijminatî biafrine an jî tenê jibo ajitasyone hatiye gotin. Mînakên li ber çava me jî rastbûyina ev zelal kirine nîşan dide.

Di zaroktiya xwe de kê xwestiye ku neyedîtin bibe û ev xeyel bike! Dibe ku neyedîtin xweş be lê, rixme ku hebûna we neye dîtin û bihîstin tê wateya tunebûyin û şikandina rûmete ye. Em, yen ku rewşa ya dûyemine dijîn, ji binketina dîrokî ya dawiya civaka komûnal ya kevn heya a niha jin û LGBTÎ+ne ku gav bi gav, roj bi roj kirasa neyedîtin li ser me hatiye avêtin. Wekî ku tê zanîn dîroke kî dinîvise, ji berjewendiya wî re xizmete bike, ji hêrî kêm dîrok li gorî nêrinên wî bihata şirove kirin. Wisa jî bû. Wekî ku Marks gotiye; Ger dîrok,'dîroka têkoşîna çînên' be, ew dema ne xwezayiye cihê ku ye hêrî em nehatine dîtin ev têkoşîn bû?

Civaka koletî tenê ji gladyatorên ku heywanên hov dihat avêtin û bi wan re didan şerkirine heye ku li dijî serhildana koletiye tenê navê wan derbas dibe? Çima tenê û tenê em navê Spartakûs dizanin, navê jinêke jî negihiştiye ji me re ye ku di nav kafîleya 120 hezar kes ku li dijî koletî sekinîne û bi rêketine de? Em bêjin ku hemû şervanên Spartakûs ji mêran ava bûye; çima navê Harriet Tubman nizanin ye ku li dijî koletiye serî xwe hildaye? Çima em gotina wê ya 'Zarokên ku nedixebitiyan dihat lêxistin….keçikên ku berê bikevin dewre dihat dest dirêj kirin…. Hawaran dibihisim. Dilopêke xwîn ya di rihê min de, dikarim ji bo ku wan azad bikim birîjinim. Dev jê bernadim. Heya ku ev wekî ku tê gotin wehşa koletî bimire!' nabîhisin?

Di li dijî şerê Almanya ya Nazî de, Wehrmacht wek 'Caduyên Şevê' bi nav kirî bû sekwana û pîlota şer ya Sovyetê bûn navê yeke ji wan ye jinên ciwan em nizanin; di 15 salê xwe de ji behtirî sed serleşkêrên Nazî bi jahr kirî bû, çavên wê hati bû derxistin û cûr bi cûr di bin eşkence de ma bû lê belê rixme vî jî îxaneta hevrêyên xwe nekir ya Zina Portnova me bihîst?

Wekî mînaka ye hêrî balkeş; Dîroka, Xwîşkên Mîrabel gava ku li dijî desthildara Komara Domînîke têdikoşiyan bûn armanca desthildariye û bi lêxistin û dest dirêj kirin hatin qetil kirin ya 25'ê Mijdarê, kengê ket rojêva şoreşger û komûnîstan û kengê 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinê ya Navnetewî bû parçêyek ya têkoşîne.

Dîsa mînakeke din a balkeş; Seroka Qomîteya Navendî ya TKP Mustafa Suphî û 14 hevrêyên wî gava ku li ava tarî ya Behrareşe bi talimata rast bi rast ya Mustafa Kemal re hatin qetil kirin, ye ku ji behra bi dijwarî hat derxistin û dû sal sax hat dest dirêjî û eşkence kirin û bi vê awayî hat qetilkirin ya navê Marîa Suphî me çend sal berê bihîst? Li gorî erşîfkirina TKP; Marî Suphî piştî ku Mustafa Suphî nasdike, tevlî TKP dibe, û ji Bakû bi komûnîstên din ve tê axên welate ku komûnîsteke enternasyonal e û heya dema nêzik jî di pelên dîroke ya bi toz de weşartî mayi ye.

Ev qas mînak bes e. Ji ber ku armanc ne derxistine holê ya maxdurîyete ye, gava ku neheqiyeke derdixin holê û serrast dikin, mîratê ev jinên komûnîst ya nemirin jî rast were xwendin û li ber bi avabûyina pêşeroje ve rê vekirina fêr bûna pratîka ezmun, jîyan, û têkoşîna wan. Jinên ku li dijî rûye dijmin ya bi sed cûre tedikoşiyan; fikir, gotin û kiryarên wan gihandina îro ye…

Dîroka desthildariye jinên bindesta ya bindest berçav nagirtî be jî, pelên kêm de hiştî be jî, em ji jîyan, têkoşîn, zanistî, pratîkên derbaskirine zehmetî, parçêkirina rolên civakî ye ku bavîksalarî dixwazî me te de bigire, qetandina ji xwe re ne bawer bûn ye ku li ser me bûye wek nasnameyekî, li dijî yedek dîtine rêberbûyine, fermandarbûyine û her wiha ji şaşti, lawazî ya hevrêyen me, ji bo ku hîn bibin divê di nav hewldaneke taybet de bin.

Ger ku dagirtina valatiya girs ya ku ew li pêy xwe hiştine, wek 'bangwaziya li ser erkê' erênî dikin, divê bi gaveke pêş ve biçin û xwe-hevdû ji nû ve biafirinin, xoliya xwe belav bikin, rêxistinbûna xwe di refên pêş de ava bikin ku zindî hiştina dîroka xwe bizanin… dema ku em vê dikin divê bizanin ku li berıya me hinêka hatibûn.

Dema ku em bemirinên xwe bibîrtînin, divê kilamên me tevlî strana pêvçûne be, divê hesrê çavên me veguhere hêrse, ger ku ye hêrî pewistiya xwe ya bi şoreşe heye em bin, divê hêrî pêş de em bin, divê em çûyina şehidên xwe wek bangwaziya mewziyên pêş ya têkoşîne qabul bikin. Divê yên ku dîroke ' kêm, derew, bialî' nivîsandine bes gazina ji wan bikin, rola maxduriyete berdin; ji aliyeke pêşeroje damezrinîn, ji aliyeke din jî divê wek avaker û nivîskarê dîroka xwe di jîyan û têkoşîne de cihê xwe bigirin.

Di encam de; jinên ku em şopdarên wan in ji mêtinkarî, bavîksalarî, heteroseksîzm, zext, koletiye berxwe dan û şer kirin, ji bo ku ji jîyan û têkoşîna wan mînak bigirin ev broşûr bila destpêke be. Di nav rafên dîroka ya bi toz û nêr em her hevrêyeke xwe bibînin û wan di têkoşîna komûnîzme de veguherinin meşaleyeke.

Yen ku ji bo Partî û Şoreşe bûne Şehid Bila Rêya me Ronî Bike!
Bijî Partîya me TKP-ML, rêbertiya wê de TÎKKO, KKB, TMLGB!

PARTIYA KOMÛNÎST A TIRKIYE-MARKSÎST LENÎNÎST
YEKÎTIYA JINÊN KOMÛNÎST

ÇILÊ 2023

MARIA SUPHI

Şoreşgera jin ya enternasyonalîst, komûnîst û Bolşevîk ye ku li Rusya tevlî Şoreşên 1905 û 1907 bûye. Di erşîfên TKP de navê wê wek Meryem hatiye derbas kirin ya Maria, ji damezrenerên TKP ye û piştî ku nasîna wê bi Mustafa Suphî ku Seroka Qomîteya Navendî ya TKP bû re li Bakû çê dibe tevlî TKP dibe û 1921 meha Çilê de bi Mustafa Suphi û 14 hevrêyên xwe ve ji Qersê derbasî Tirkiye dibe. Ev 16 komûnîst, ji aliya rejima Kemalîst gela proveke kirin ve hat protesto kirin û li ser wan provokasyon hat meşandin.
Maria jî tevî van heya dawiya rê hat taciz kirin.

Şeva 28-29'ê Çilê ye ji aliyaYahya Kemal û yên pê re ve ji motoreke re hatin siwar kirin. Ev, rêwîtiyek ya mirine bû. Di Behrayareş de Mustafa Suphi û 14 hevrêyên wî bi lêxistin, bi kundaxa çêk ve hatin qetil kirin û avetin nav behra ye. Maria Suphi li vir ne hat qetil kirin; lê belê dît ku hevrêyên wê bi lînce hat qetil kirin û cezayekî mezin lêbirî bûn ku bi eşkence û bi dest dirêj kirine re heya mirina wê ya piştî 2 sala domand.

Ji motor bi dijwarî pêya bû û anîn Trabzone ya Maria, li taxa Çomlekcî di maleke de hat girtin û wek ganîmet hat dayin ji Yahya Kaptan re. Ji bo jîyana Maria di çavkaniyan cûre de agahiyên cûr be cûr hene, pê ve girêdayi, di encam de em xwediye vê agahiyene ku ev jîyan, bi eşkence, tecrîd û dest diêji ve tijî bû û Maria qet hêvîye xwe wenda nekir

Mînaka hêrî girîng û balkeş e'sûîqastê bedengî' yên ku li ser jin tên meşandin ya li axa welata me Maria Suphi ye.

MERAL YAKAR

Dîroka Şehidbûn: 25'ê Çilê 1973

Meral Yakar (Kînem) di sala 1950 de li Dîlok ya navçeya Nîzîpe ji dayik dibe û li beşa Tip a Çapa ya Stenbole ji bo xwendine xwe tê û têkoşîna eqedemik-demoqratîk ya ciwanan pê bandor dibe û di demeke kurt de di nav têkoşîne de cihê xwe digire.

Bi nasîna Meral ya fikrên şoreşgerî re nebû zehmet. Ew, piştî ku ev fikrên di nav kesayeta xwe de wek kir cewher, ji bo ku di refên şoreşgerî ya hêrî pêş de cih bigire hewldaneke pir mezin da.

Di rêveberiya Îbrahîm Kaypakkay de wek birdozî û sîyasî li dijî têgihiştina her cûrê revizyonîstên PDA û oportonîste têkoşîne sîyasî ya xurt ku dihat meşandin û li dijî meşandina têkoşîna dewleta patron-axa di refên Partiya Proleterya de cih girt û têkoşîna xwe domand û bû endama TKP-ML ya jina destpêke. Girêdanbûna xwe ji gel, şoreş û partiya xwe re di pratîke de derxist holê.

Li Stenbole gava ku hevrêyeke wê sîlêhe xwe paqij dikir, qezeyeke çêbû û birîndar bû. Da ku birîna wê giran bû wê rakirin nexweşxane, kûjerên ya eşkencevan Meral naskirin û rixme ku birîndar bû wê girtin lêpirsine. Meral kevirên mihenk ya kevneşopiya berxwedaniya Partiya me lêkir. Û di 22'ê Çilê 1973 de piştî ku wek birîndar rakirin nexweşxane, eşkencevanen wê 25'ê Çilê 1973 de di nav binçavkirine de qetil kirin.

SIRMA BOYOĞLU

Dîroka Şehidbûn: 7'ê Îlonê 1978

Di sala 1958 de navçeya Rêfahiye ya Erzingane hat dîne. Ji sedemên aborî tevahî malbat bar kirin Stenbole, cihe kedkar ya taxa Yayla cih bûn. Sirma,bi bandor bûyina biraye xwe ya Ali Riza Boyoğlu re fikrên şoreşgerî hez kir. Di sala 7'ê Îlonê 1978 de li Tuzla ji komeke faşîst ya sîvîl belavok belav dikin. Ji aliya hêzên şoreşger demoqrate ku di nav van de Sirma jî heye ve ji mûdaxaleya van faşîsta dikin. Da ku faşîstên sîvîl ji mudaxale re amade bûn, êrîşa bi çekdarî kirin. Sirma, encama vê êrîşa bi çekdarî ve bi lêketina guleyan bû bemirin.

ELIF ATAKLI

Dîroka Şehidbûn: 26'ê Avrelê 1981

Elif, gava ku mîlîtane TKP-ML bû di 26'ê Avrelê 1981 de li Almanya bi encama qezeyeke bû bemirin.

NURHAYAT TEKE

Dîroka Şehidbûn: 1981

Nurhayat ku di sala 1949 de hatiye dîne, li Almanya wek alîgira TKP-ML têkoşîne dimeşand di dîroka 1981 de bû şehid.

BAHAR YILDIZ

Dîroka Şehidbûn: 1ê Gulanê 1982

Bahar ku mîlîtane TKP-ML bû, di sala 1963 de navçeya Nazimiye ya Dêrsimê hat dîne. Di 1ê Gulanê 1982 de li Kartak ya Stenbole gava ku belavoka 1'ê Gulanê belav dikir, ji aliya bi gule berdana hezên faşîst ve ji pişte xwe hat lêxistin û qetil kirin.

CAHIDE KARAKAŞ

Dîroka Şehidbûne: 1984

Li zindana Amedê ku Cuntaya Faşîst Leşkêrî ya 12 Îlonê ku ye hêrî giran hat dijîn, Cahide Karakaş, di êniye jin ya berxwedane de cihe xwe girt ji nav hevrêyên de. Bi bandorbûyina xebata Partiya me ya li Sivereke, keça malbateke dildara Partiya me bû Cahide, di vê qade de gava ku têkoşîna çekdarî destpê kir, di heman demê de mîlîtane jineke şervan bû. Ji ber zextên ku malbat dîtin bar kirin ji Stenbole û bi Partîya me têkiliya, ji ber bi operasyoneke Partîya me ve hat binçav kirin û birin eşkencexaneya Amed Kurtoxlu û di zindana 5. ya Amede de hat girtin. Cahide li dijî eşkenceya di nav girtîgehe de bi hevrêyen xwe ve berxwe da, di 1983 de piştî ku girtîbûna wê bi dawî bû mala ku bi malbatên xwe re dijiya ya li Stenbole, da ku li hembere ev qas eşkenceye ku dît, nikarî bû bihemiline di sala 1984 de jîyana xwe bi dawî kir.

CEVHER YAŞAR



Dîroka Şehîdbûn: 8'ê Tirmehê 1985

Cevhere ku wek mîlîtana TKP-ML xebat dimeşand, gunde Pulan a Navçeya Mazgirt ya Dêrsimê ji dayîk bû. Fikrên Partiya me di salên 1978-1979 de li lîse naskir. Di nav ciwana xwendekar de xebat meşand. Piştî ku cezadayina muxtara gunde Pulan li gundên Pulan, Haraba, Beroç, Kuşxane ve Velyan ya Mazgirte faşîzm êrişê girtine pêk anî û ew jî bi wan re hat binçav kirin. Li Dibistana Şevînî ya Heremê ye Dersim Mazgirt Germisi bi gundiyên ve eşkence dît û di 8'ê Tirmehê 1985 de di eşkence de hat qetil kirin.

KAMILE OZTURK

Dîroka Şehidbûne: 22’ê Mijdarê 1986

28’ê Şubatê 1956 de gunde Alaca-Eskiyapar ya Çorumê hat dînê. Kamile (Nuray) di sala 1980 de li Enqere bi Partiya Proleterya ve têkildar bû. Havîna sala 1982 de da ku xebata karkera bimeşine ji herême Çukurova re hat rêkirin. Mehekî pişt re li ya cihê Siteler ye Mersînê da ku dû valizên ku li cem sempatneke hiştî bûn bigire, raste kemina polîsan tê û tê dîl girtin. Polis ji rapora qomîteyan dizanîbû ku ye ku bi destxistine keseke girîng e. Lewma jî hemû cûreyên eşkence bikardianîn û giranî didan li ser wê. Eşkenceyên giran têre wan nekir, ji aliye eşkencevanan bi navê Mistefa… ya dijmine gel ve hat dest dirêj kirin. Ji eşkenceyan behtir bi hêrs bû û bi moraleke mezin, serbilind derket ji şaxa sîyasî. Û berxwedaniya xwe barkir ji dadgehên re, çi li gava lêpirsinê çêbû bi tevahî tazîtiya ve veguhezt û ne ye ku hat dad kirin, lê ye ku bû dadbar kir. Piştî ku hat berdan tevlî refên gerîla bûye. Jiber amedekariya Konferanse, Kamile çû li cem hevrêyên xwe. Bi 7 delege ve hat oxir kirin ji bemirine re.

BESIME DOĞAN- SUNA YILDIRIM

Dîroka Şehidbûna van: 1’ê Berfanbar’ê 1986

Sala 1986 ya 1’ê meha Berfanbarê di navbera hezên dijmin û gerîlayên TKP-ML TÎKKO de li gunde Geçitveren ye Mazgirtê pêvçûn derket û Suna Yildirim, Besime Doxan şehid ketin.

Hevrê Besime, li gunde Pakire a navçeya Xozat ya Dêrsimê hat dînê. Bi navê hereke Dîlan ku 1985 de tevlî refên gerîla bû. Ji xwendin û nivîsandine re li gerîla fêr bû. Gava ku şehid ket, milîtana pêş ya TKP-ML û şervana TIKKO bû.

Hevrê Suna Yıldırım, gundê Bargini(Karabakir) ya Xozatê 1967 de ji dayik bû. Navê wê ya hereke Meral bû û 1986 de tevlî refên gerîla bû. Gava ku şehid ket, milîtana pêş ya TKP-ML û şervana TÎKKO bû.

FECIRE YILDIRIM

Dîroka Şehidbûn: 21'ê Avrêl'ê 1987

Li gunde Zankirek(Karaçavuş) ye navçeya Xozat ya Dêrsimê sala 1962 de ji dayik bû. Bi navê hereke Eylem ya Fecire, sala 1985 detevlî refên gerîla bû. Gava ku şehid ket, milîtana pêş ya TKP-ML bû.

ZÜHRE DERSİM

Dîroka Şehidbûn: 14'ê Îlonê 1988

Bi gotina xwe ya 'Baş e ku ji xweşikbûna dînê re dijmin, derewin em dibînin; baş e ku bi qase zilmên ku jîyana me bi dawî bike em dizanin; ne ji ber vê ye ku af naxwazin û af nakin' re, dilê wê tam di nav pêvçûne de, bi hasreta welate ve şewitî ya ku sempatîzana TKP-ML bi navê Zühre, 14'ê Îlonê 1988 de li Swisra ji ber nexweşiya kansere jîyana xwe ji dest da.

PERİHAN ÇOLAK

Dîroka Şehbûn: 19'ê Mijdarê 1990

Bêrîvanê çîyayên Kûrdistana Tirkiye hevrê Perihan, 1960 de navçeya Zara ya Sewazê ji dayik bû. Bi cih bûna malbata wê li Stenbolê ve şoreşgerên naskir û hîn li salên xwe ye lîse bû jî tevlî çalakiyen bû. Esenket a navçeya Gulsuyu ya Stenbolê xebat meşand. AFCye ya 12 Îlonê, ne ji wê ji binketine re tef da berevaji ji behtir agira têkoşîne gêş kir. Li dijî çande nirxên feodal her tim têdikoşand. Helbet dereng nema, ji xebata wê ya bi israr faşîzm jê acîz be. Nivî şeveke, ji aliya polîse ve ji mal hat girtin û ji lêpirsina van derbas bû û wê avêtin Zindana Metrisê. Li girtîgehe jî helwesta xwe ya bi israr û coş domand. Piştî ku ji zindana derket bi heman sekna xwe ya bêdudilî re berdewam kir. Yekser bi TKP-ML re tekiliya. Dîsa di nav karkeran de destbi xebata xwe ya aktif kir. Nîviya sala 1988 de nav têkoşîna gêrîla de cihê xwe girt. Di demeke kurt de bi ye ku bi coşeke mezin destpêkiri bû ya jîyana gêrîla bû Bêrîvana gundiyên Dêrsimê. Di herême de ji bo rêxistinbûna jin rola xwe lihist. Perihan, di 19'ê Mijdarê 1990 de pêvçûna ya bi dijmin re şehid ket.

HATICE DILEK

Dîroka Şehidbûn: 19'ê Gulanê 1991

Komkûjiya Hasanpaşa, piştî sala 1980 înfaz kirina bêdad ya bi destpêkirina komkûjiya Tuzla re bû xelekeke girîng. Di 19'ê Gulanê 1991'ê de li Hasanpaşa ya Kadikoy 23.00ê şevê endama TKP-ML Ismail Oral, militanê TKP-ML Hatice Dilek li ber çavê kurê wê ya Ozgur Cihan hatin qetil kirin.

Di raya giştî de wekî ku 'Qanuna Anti Terore' tê nasîn; lê di cewhere de tê watê ya ku wek qanûna cih bûna terora dewlete ye. Pê ve girêdayi bi ketine meriyete ya vê qanûnê ve kûjerên eşkencevan planan xwe ya bi xwin pêkanin. Çapemeniya burjuva, piştî qetliame ku nûçeyên destpêke de bi derewên xwe ya 'tîma mirina hat destxistin, pêvçinî û mir, ji bangawaziya xwe teslim bike re bi agir ve bersiv da.' û hwd. re hevkariya xwe ya qetilkirine wek erkeke baş bi cih anî.

Zaroktiya Hatice Dilek li taxa Gulsuyu ya Stenbole derbasbû û di sala 1958 de li gunde Beraj ya Elazîz ji dayik bû. Dibistana sereke li Stenbole qedand. Ji ber dijwariya aborî hem dixwend hem jî li Fenerbahçe diçû karên malê. Fikrên şoreşgerî li lîse naskir. Bere ku şehid bikeve di nexweşxaneke de wek laborant kar dikir.

Hatice ya milîtana TKP-ML, mala ku bi kurê xwe û ismail Oral re diman li wir hat qetil kirin. Hatice Dilek li Goristana Gulsuyu hat weşartin. Malbatên Hatice Dilek û Ismail Oral piştî qetliama ji du roja bi daxuyaniyeke ve rûyê rastî ya bûyerê anîn li ber çavê.

Ye ku ji hêrî nêz ve şahida bûyere Ozgur Cihan ya kûrê Hatice ye. Ne ku wekî ku iddiya polisen û nivîsên çapemeniye dayika wî di pêvçûn de ne hatibû kûştin. Jixwe Ozgur berê ku ji malê were derxistin, polis wî girtî bû û dayika wî jê re da ku bavê xwe bigere pera jî da bû. Di destê dayika wî de sileh nîn bû. Paceya malê saxlam bû, rêça mermiyek jî nîn bû.

KUMRIYE CIHAN

Dîroka Şehidbûn: 28'ê Gulan'ê 1991

Di 28'ê Gulan'ê 1991 de li navçeya Palu ya Elêzize pêvçûna ku bi hezên TC ya faşîşt re derket, şehid bû. 1974 Navçeya Xozat(Bargini) ya Dêersimê ya ku hatiye dînê Kumriye(Dîlan), bi zanista destpêke bûyina xwendekara gel, pişt re bûyina mamosteye gel re tevdigeriye û di vê xete de bi girsêyen ve girêdanbûnen ku naye qetandin ava kiriye. Di 29'ê Adarê 1991ê de tevlî refên gerîla dibe û bi taybetî jinên ku li gund dimînin bi awayekî hesan gotûbêje xwe ava dikir, ji wan re di şoreşe de rola jin, armanca Partiya Proleterya vedigot û bi vê awayî jin li der dora xwe kom dikir.

Piştî şehidbûna wê, ji aliya malbatê ve cenazeya wê ji Palu tê girtin û li gundê wê tê weşartin.

HURIYE ÇITAK

Dîroka Şehidbûn: 28'ê Cotmehê 1991

Di sala 1968 de gunde Keşlik girêdayi Alaca ya Çorumê hatiye dînê ku Huriye Çitak, ji ber zehmetiya aborî dibistana sereke û navîn di dibistana şevînî de qedand. Nasîna wê bi têkoşîna şoreşgerî ve ji ber encama ecibandina têkoşîna ya Îbrahim Kaypakkaya dibe. Destpê Zaningeha 19 Mayis a Samsunê ya beşa bîrkarî dike. Rêxistinbûna wê bi xebata ciwana re destpê dike. Gava ku li Samsunê dixwine ji şagirtan re dersên bîrkarî jî dide. Gava ku wek mamosteyeke stajyer karê xwe didomand, bi şagirtên xwe re bi têkiliyên xwingerm re ji wan li dijî faşizme pêwistbûna têkoşîna şoreşgerî perwerde dike. Sala 1989 de bi gihandina Dêrsimê ve wek şervaneke girêdanbûna xwe bi gel re demek kurt de pêşdixe.

Li gêrîla navê wê ya hereke Ozlem e. Komeke gêrîla ya ku têde Ozlem jî heye, di 28'ê Cotmehê 1991ê de dadikevin gunde Kurukaymak(Koçeri) ya Xozatê. Gruba pêşeng, da ku li gund binere ji pêşî diçe. Gêrilayên din jî li ser girêke ya nêzi gund mewziya xwe digirin. Ji ber baran û mijê tevgerên gêrîla dikeve zehmetiye. Gruba pêşeng, gava ku li gund dinere fark dike ku li gund leşkêra Tirk tê de ye û bi nîşaneke ve agahi dide ji gêrîlayên din re. Koma gêrîla ji cihên xwe wek tîm bi tîm derdikevin. Grube gêrîla ya ku Ozlem tê de ye nîşandana guruba pêşeng şaş fêhm dikin û dadikevin gund. Nêzi mal dibin û leşkêr gruba gêrîla fark dike û gule berdide, Ozlem ji çokê xwe birîndar dibe. Daku ew hê difikire ku li gund hevrêyên wê hene, diqire 'bisekinin, gule bernedin, em in' lê vê care jî gule ji eyniya wê lêdikeve û şehid dibe.

Huriye, gava ku şehid dibe Endama TMLGB û şervana TÎKKO bû, dijmin dixwaze bavêje bîreke lê gundî li dijî vê derdikevin û wê bi destên xwe wedişerin.

GÜLSEREN AĞGÜL

Dîroka Şehidbûn: 12ê Gulanê 1992

Li navçeya Mazgirt ya Dêrsimê Muxtar Kemal ya ku ji serdema AFCya 12ê Îlonê 1980 heya 12ê Gulanê 1992, têkiliya xwe bi dijmin re qut nekir, encama bi bîryara hêzên TiKKO ve tê ceza kirin. Piştî vê çalakiye ya serkefti, ji aliya hêzên dijmin ya ku di herême de di nav operasyone de bûn ve cihên hêzên gêrîla eşkere dibe û êrişên bi roket bombê tên kirin di encama vê êrişê de Gülseren Ağgül şehid dikeve.

Gülseren (Kamile), di sala 1972 de li gunde Karataş a navçeya Pulur ya Dêrsimê ji dayik dibe. Îlonê ya sala 1990 de têkoşîne ku destpê dike, di 12ê Gulanê 1992 de ji hEvrêyên xwe re dewir dike û wek milîtaneke TKP-ML şehid dikeve.

YILDIZ ÇiÇEK

Dîroka Şehidbûn: 1ê Puşberê 1992

Yildiz Çiçek(Kînem) di sala 1968 de li gunde Gevrek ya girêdayi Navande Dêrsimê hatiye dinê, sala 1989 de tevlî di refên TKP-ML de tevlî gêrîla bû. Kînem di 1991 de bû Endama Partiye û di bihara 1992 de wek qomîtana gruba gêrîla ya ku diçûn Artvine. Li Şavşat ya Artvine di 1ê Puşberê 1992 de ji ber danina agahiyên ya sixureke, dijmin gruba gêrîla ya ku Yildiz jî tê de dorpêç dike. Rixme ku jimarî û çek ya gruba gêrîla lawaz bû li dijî dijmin berxwedaniya lehengî bi seatên didome. Di pêvçûne de Kînem şehid dibe, lê belê hevrêyên wê pêvçûne didominin û dorpêç qut dikin û ji dorpêçe xilas dibin. Di vê pêvçûne de şadbûna wî di dilê wî de ma û tişte ku hêvî dikir nedît, ya ku şefa kontrgerîla li hembere leşkêrên xwe bertêka xwe wisa nîşan dide: 'we, min ji gelên Şavşate re rezil kir.' û bi vê hêrsê xwe re laşê hevrê Yildiz hewl dide ku ji gelên Şavşat û leşkerên xwe re teşhir bike.

NURGÜZEL YAŞAR

Dîroka Şehidbûn: 19'ê Tirmêhê 1992

19'ê Tirmêhê 1992 de li Kartal Maltepe hat qetil kirin. Nergüzel di sala 1969 de gunde Baykara a qezaya Selim ya Qersê ji dayik dibe ji aliya dê ve Çerkez e, jîyana xwe li Gultepe ya Stenbolê derbas dike. Hevrê, ji biçûkaniya xwe de bi şoreşgerên ve nav hev de bû, li Gülkade gava ku dersa dîlane dida tevlî têkoşîna birêxistinî dibe.

Di sala 1991 de tevlî jîyana şoreşgera pîsporî dibe. Di tevahî jîyana wê de bala hevrêyên xwe dikşand bi taybetmendiya xwe ya bi awayeke hêsan têkili ava kirine ya mirovan re.

YILDIZ AYRIÇ-GAZEL MERAL

Dîroka Şehidbûna Wan: 23'ê Tebaxê 1992

Roja 23ê Tebaxê 1992 grubeke TİKKO ya bi deh kesa li Kepir ya Pulurê dikevin kemineke di encama agahî danîna sixureke. Pêvçûn 12 seat didome. Endama TİKKO ya Yildiz Ayriç şehid dibe, Gazel Meral jî bi birîndarî dikeve dest û di eşkence de tê qetil kirin.

Gazel Meral 1971 li gunde Burnak a Pulur ya Dêrsimê tê dinê, gava ku şehid dikeve milîtana TKP-ML û şervana TÎKKO bû. Gazel di vê pêvçûnê de bi birîndarî dikeve deste dijmin, û ji ber eşkenceyên tê qetil kirin.

BARBARA ANNA KISTLER

Dîroka Şehidbûn: 21'ê Çilê- 10'ê Şibatê 1993

Dawiya Çilêya sala 1993 Gruba Mintika II. Ya TİKKO da ku cihê wan ya zivistane deşîfre bû û êrişa dijmin ya ezmanî destpê kir mecbur man ku cihê xwe biguherin. Ev gruba gêrîlla li Çîyaye Yel destaneke afirand. Li pêşiya wan 2 rê hebû: an deşte ku dijmin cihê xwe girtî bû biçin wir û imha bibin; an jî derbaskirina Munzur. Bi encama wan meşa bi dijwarî gava ku digehêjin gund bi zature dikeve û şehid dibe Barbara.

Barbara, di sala 1955 de bajara Zurich ya Swisra ji dayik bû. Piştî jîyana xwe dibistane ya kurt destpê xebatê kir. Bi sala xwe ya 16 re ji sîyasete re nêz bû. Ketiye hewldana dîtina rastiya rûyê weşartî ya welata xwe li dijî pergale derketiye, rêxistinên guncav ya li gorî fîkra wê cih girtiye,di têkoşîna meşandina xebata antî-faşîst antî-emperyalîst de ye hêrî pêşî cihê xwe girtiye. Rêxistineke otonom ya Reboolie Bunker diecibîne, li welata xwe li dijî zexte dewlete weşartî û vekirî tevlî rêxistinbûna kampamanya dibû, berteka xwe nîşan dida. Di sala xwe ya 17 de li dijî êrişa komune ku ew bi dostên xwe ve ava kir, bi qasî 3 heftê li girtîgehê ma. Di heman salên de piştgirî da Vietkong, bi grubên çêp ye radikal yên girtî re jî di nav piştgirtineke de bû.

Di salên 1980 de li Avrupa şoreşgerên Tirkiye nasdike. Di Qomîteya Piştgirtina Girtiya ya ku li girtîgehên Tirkiye li dijî êrişên ji şoreşgerê derdikeve de cihê xwe digire. Gava ku bi grubên antî-emperyalîst re di nav piştgirtine de bû wek rojnamevan diçe Peru. Li Nikaragua ji ber hatina desthildariya ya Sandinistan ji bo di nav rêxistin kirina dildariyan ya ku ji Avrupa diçin de cih digire. Di 1989 de bi TKP-ML re derbasî têkiliya rêxistinî dibe. Bi hevnasîna TKP-ML re dibe xwedi têgihiştina MLM û ji mînakên herî mezin ya enternasyonalîzme nîşan dide û bîryara tevlîbûna têkoşîna şoreşe ya Tirkiye dide. Reviyên Metrîse da ku wek pratîk ji nû ve dîsa di pevajoya têkoşîna sosyalîzme de cihê xwe bigirin wek aktîf tevlî dibe. Ji piştî vê li Stenbolê bi cih dibe.

19'ê Gulanê 1991ê de mala ku bi Ismail Oral re dimine operasyon tê kirin û dikeve destê dijmin. Eşkenceyên ku 15 roj didome kevneşopiya 'ser dayin, sir ne dayin' ê ji xwe re esas digire. Di girtîgehe de hevkarî û dijmanitiya gel ya dewleta Tirk û Swisra behtir şenber dijî. Girtîgehe wek dibistana şoreşe, dadgehe jî wek kûrsûya şoreşe bikartîne. Piştî girtî bûna ya 8 meha daxwaza wê ye ku di şerê gêrîla xeleka navenda têkoşîna çînî ya Tirkiye de cih bigire. Keça karkera ya proleteryaya entrnasyonalîzme Barbara(Kînem), di nav artêşa rizgarkirina gelên me ye netewên cûda yê TİKKO

de cih dibe. Bi vê awayî dibe, mîna herî şenber û zindî ya enternasyonalîzme. Di demeke kurt de şert û mercêyên ku jê re xeribe fêr dibe. Hezkirina bindest û faqir ya gundiya Dêrsimê digire.

Qampa Zivistane ya Demkî a Yekeniye Mintika 2. ya TÎKKO ku nêzi Pûlûmûr cih bûne ji aliye dijmin re hat deşifre kirin û 21ê Çilê 1993 hat dorpêç kirin. Yekeniyên gêrîla çawa fêr dibin ku qamp di dorpêçe de ye, tevahi girên li der dore qampe yekeniyên xwe ya pêşeng bi cih dikin. Dijmin bi 3 balafire bombebaran ya ku ji Erzirome rakiriye, 3 helikoptera kobra re destpê bombebarane dike. Çi xweşe ku dijmin, nikari nêzi gêrîla bibe û nikari ji gerîla windahi bibe. Ji aliyeki dijwariya şert û mercêyên zivistane ji aliyeke din jî êrişên dijmin yekeniyên gêrîla mecbur diminin ku dev jê herême berdin. Da ku Gundên Herêmên ku yekiniyên gêrîla dimine di bin dagirkirina leşkêrî de bû yekeniyên nikaribûn derbasî gunda bibin. Di bin dijwariya şert û mercêyên zivistanê de piştî bi meşeke dirêj û 3 gêrîla şehid dikeve, gunde ku hati bû armanc kirin digehêjin. Lê belê piştî gihandina gund 3 gêrîlayên din jî şehid dikevin. Yeke ji wan Barbara Anna Kirstler, tevlî navên ku naye jibîr kirin ya proleteryaya enternasyonal dibe. Ne li hembere dijmin, li hembere şert û mercêyên zivistinê ya bi dijwarî bin dikeve.

Bi danina mînaka yê hêrî xweş ya enternasyonalîzme, gava ku di refên partî da têdikoşiya li Çîyaye Yel şehid ket, ya şervana mînak ya proleteryaya enternasyonel ya Barbara Anna Kîrstler, TKP-ML bi Endamtiya Rûmetî ya Qomîteya Navendî re bi tacîdar kir; têkoşîn û xizmeta wê ji Partî re zindî hişt.

NURGÜL BÖLÜKBAŞ

Dîroka Şehidbûn: 16’ê Tebaxê 1993

Di 15ê Cotmehê 1970 li Fatsa ya bajara Ordu tê dinê ku Nurgül Bölükbaş (Yıldız) li girêdaye malbateke paşvêrû û dewlemend bû. Beşa Hemşiretî dibistana Bilind ye Zaningeha Komara ya Sewasê qedand. Fikrên şoreşgerî di 1988 de di salên xwe ya zaningehe de nas kir. Piştî zaningeheqedand li Nexweşxaneya Dewlet ya Sewasê xebitî. Heya ku tevlî TÎKKO bû, di nexweşxane de di beşên lêzgîn, cerrahî û KBB de xebitî û heman demê de endama sendîkaya tendûristî ya Sewasê bû. Nurgül ya ku milîtana TKP-ML bû, di 16’ê Tebaxê 1993 de li mezraya gunde Ortaalan nahiyeya Topçam navçeya Mesudiye ya Ordu gava ku yekeniyên TİKKO îstîrahatê de bûn, di encama ixbara sixureke de bi pêvçûna hêzên TC ve bi Muzaffer Kahraman re şehid ket.

MERAL KAHRAMAN-ZEYNEP KAHRAMAN

Dîroka Şehidbûn: 9’ê Cotmehê 1993

Veli Kahraman, zarokên wî meral û Zeynep Kahraman li gunde Doğan a navçeya Çemişgezek ya Dêrsimê ji aliya gêrîlayên PKK ve hatin qetil kirin.

